

Weşana Deng Û Çend têbînan

- Memê Alan -

Piştî ez rastî hejmarê 90 î ji weşana Deng di entirnêtê de hatim , ez pir pê kêfxwaş bûm . Wêlomê min bi lez çavên xwe li nav rûpelên wê gerandin , û navnîşanên wê xwendin . Bêtirîn sergotara hejmarê ya bi navnîşana \\ **Rewşa hundirî girijîtir dibe** // bala min ber xwe kişand . Min rabû hûrik- hûrik sergotar xwend , herweha min da ber nixwandin û pîvanê . Berî ku , ez nixwandina xwe ji sergotarê re derxim hole , min telefonek ji endamekî wê Kevin ku , min nasdikir re vekir , da ku silavekê lê bikim û çawabûna nivîsandina wê jê bipirsim . Ji min re got , dibe ew ji erebî hatibe wergerandin , bi xwe ez jî di wê gumanê de bûm . Piştî min dît hêja ye , ku ez bi çend têbînan , sergotara hejmarê ji desteya birêvebirina weşana Deng û xwenerên wê re binirxînim , belkî bi kêrî rastnivîsa zimanê me , û pêşxistina weşana Deng were .

*- Pêşî armanc ji nivîsandina mijarekê bi zimanê dê , fêrkirina zimên û têgihîştina ramanekê ye . Ji ber van sedemên jêrîn , min ev herdu armanc di sergotarê de kêr dîtin .

1- Sergotar ji zimanê erebî hatiye wergerandin . wegerandin Bixwe jî ji zimanekî ta zimanekî dî – ger wergêr hostebe – reseniya mijarê weke heye nahêle .

2- Wergerandin hostatîk jê re divê , yanê divê wergêr baş bi herdu zimanan zanibe , û baş têbîghê naveroka mijara resen , paşê wê naverokê bi zimanê nû birêse . Mixabin , xwediyê sergotara hejmarê bi nezanî ew wergerandî . Wî

gotara erebî dayî ber xwe , û hergotinekê wê yeke kurdî – dibe pir jê ji ferhengekê derxistibe , û wateya bêjeya erebî ndabe jî – li şûnê danî be . Wêlomê herçûye sergotar durrî rastnivîsa zimanê kurdî bûye , ji hev ketiye , û naveroka wê wendabûye . Yanê xwenerê wê kêr jê fêrî zimanê dê dibe , û kêr têdighê naveroka wê jî .

Ez ji weşana Deng ya hêja û desteya wê yê bira lêborînê hêvî dikim . Lê , li dawiya dawî , armanca min ji vê nixwandinê sudegirtin , pêşxistina xwendin û rastnivîsandina zimanê dê , û pêşxistina vê weşana pîroz e .

Belê ezbenî derewînm

Canşêrê Sencqî

Teq-teq.. Qazî li masê xist û got: Şiyaro, bibore.. derewên et nahêlin ku, em te ji rûniştvanên Almaniya qebûl bikin. Derewên te ev in :

Yekem : Gundê te ARZANA ji sînora Tirkîyê bîst û pênc K/m bêtir dûre û ew ne di KEMBERA erebî de ye, weke te gotiye.

Duwem: Tu kurê Çeto yê xencerî û nasnama we heye, ne ewke te gotiye ku, ji qurbanên Jimara Awerte yî.

Teq-teq.. Qazî got: fermo Şiyar tu çî dibêjî. Şiyar : Belê ezbenî , ya te raste, ez derewînm im. Fermo mamuste, were li welarê me Sûriyê bijî, eger wînm rastgo mayînm, wê hîngê ji mire bêje qurban!?..

Temenê min bîst û heşt sal in. Yek roj azadî min nedîtiye, li welatekî bê destûr mezin bûme . Min dewre bi taştê û şîvên xwe re xwarî û vexawriye . Bi viran tenê jîyan li welatê me didome.

Belê ezbenî ya te raste ez derewînm im